# Mitt Helsingborg

## Rehbera pirkirinê bo **kontrolên nimûneyî** (stickprovskontroll) bi app’a ”Mitt Helsingborg”

**Kontrola bêhişyarî**

Pirî caran gava hûn muracaeta arîkariya darayî dikin, ne pêwîst e ku hûn beyanên bankê yan wesile (kvîtto) bişînin, lê carinan dibe ku li ser muracaeta we kontrolên nimûneyî çêbibin.

Di kontroleke nimûneyî ya rasthatî de, pêwîst e hûn wêneyên bingeha dahat û mesrefên ku we di muracaeta xwe de diyar kirine, bo me bişînin.




**1. Ketina nav (logga in)**

Bo we yan di cih de yan jî piştî şandina muracaetê bi wergirtina SMS’ekê tê diyarkirin, ku tiştek nû di doza we de qewimiye, doza we ketiye ber kontrola nimûneyî ya bêhişyarî.

Hingê bikeve (logga in) di nav ”Mitt Helsingborg”.




**2. Rûpela Destpêkê (Startsida)**

Dema tu ketî nav malpera ”Mitt Helsingborg”, hingê rûpela ”Mina ärenden” (qeziyên min) diyar dibe.

Eger rewş (statûs) Stickprovskontroll (Kontrolkirina Nimûneyî) be, hingê tu dikarî bi bişkoka  Starta ”stickprov ”ê, forma kontrolkirina nimûneyî bidî destpêkirin.




**3. Hingavên kontrola nimûneyî**

Berî ku hûn dest bi barkirina (ladda upp) dokumentên xwe bikin, hûn dişên bixwînin ku li proseya kontrola nimûneyî mirov çawa dike û kîjan gavan davêje.

SERINC! Eger hûn di gel yekî din pêkve muracaet bikin, divê belgeyên we her duyan jî bo kontrola nimûneyî bihêne şandin.




**4a. Wasileyên hesaba bankê (kontouttdrag)**

Yekem tiştê ku divê tu barkî ser malperê wêneyên wesileyên bankê ya hesaba banka xwe.

SERINC! Divê ev wêne hemî hesabên te yên bankayê nîşan bidin, eger ku di hesabê te de 0 kron jî hebe.




**4b. Te kontoutdrag (Wasileyên hesaba bankê) heye?**

Bikeve nav banka xwe ya internet'ê.

SERINC! Çi wêne ji App'a bankê ya telefona mobîlê nayê qebûlkirin, divê ji banka te ya înternetê be.

Here nav hesabê bankê û di navbera kîjan tarîxan de divê wesileya bankê were xuyakirin, hilbijêre. Divê ji 1ê heyva berê heta roja îro be.

Wesileyaa bankê bike formata PDF.




## 4c. Wesileyên bankê barke

Dema we PDFya wesileya bankeya we li ser şaşeyê ye, bi têlefona xwe wêneyek bigre da ku wesileya bankê di xezna têlefonê de bête tomarkirin.

Hingê wesileya bankê hilbijêre û wêneyek ji xezna telefonê hilbijêre.

SERINC! Li ser iPhone-ê, gava ku hûn yekem car pirsê dibînin, hilbijêrin ku hûn xwe bigehînin hemî wêneyan.




## 4d. Wêne ji xezna telefonê hilbijêrin

Wan wêneyên ku wesileyên banka we nîşan didin ku we divê hûn barkin hilbijêrin. Dema ku wêneyek tê hilbijartin nîşaneke şîn di quncikê de xuya dike. Bo bişêyî wêneyan verêkî bo kontrola nimûneyî bitikîne ser ''Done''. Eger hûn di gel yekî din pêkve muracaetê dikin, hingê divê wasileyên we her duyan werin barkirin, eger di hesabê de 0 kron jî hebe.




## 4e. Wêne pêvekirî ne

Nûke we şiya ew wêneyên ku wesileya banka hewe nîşan didin hûn bar bikin. Bikirtînin 'Nästa' da ku bidomînin.




**5. Mûçe**

Heger we mûçe standibe, divê hûn wêneyeka lönespecifikation (tefasîlên mûçeyê) ku we ji kardêrê xwe wergirtiye bar bikin.

Tu dişêyî wêneyekê bi prînt-screen bigirî yan kamerayê bikar bînî da ku wêneya belgeyê bigrî.

Heger te qet mûçeyek wernegirtibe, biçe hingaveke din.




**6. Dahatên din**

Eger te dahateke din standibe, bo nimûne ji firotina tiştekî, hingê bo her hatinekê wêneyekê dişînî.

Heger we dahateke din ne be, biçe hingaveke din.




**7. Fatoreya îcara xanî jî bişîne**

Di vê hingavê de, wêneyeka lêçûna hewe ya kirê xuya dide, bar dikin. Di fatoreya kirê de xuya dike ku hûn her heyv çiqas icare didin.

Yan wêneyeke tomarkirî ya ji xezna wêneyan a telefona xwe, yan jî bi kişandina wêneyeke nuh bi kamerayê wêneyeke fatûreya kirêya xwe bişînin.




**8. Wêneya karta bus'ê**

Heger te qarta bus'ê / yan bîtaqe kirîbe, wêneyê wesileya ji Skånetrafiken bigire li vir verêke. Bi gelemperî wesile bo e-maîla te tête verêkirin.

Heger te qarta bus'ê / yan bîtaqe ne kirîbe biçe hingaveke din.




**9. Wêneya qutîka dermana yan mesrefa bijîşkî**

Eger te bo mesrefa dermanan an mesrefa bijîjkî muracaet kiribe, ew wêneya wesileya ku mesref têde duya dibe bişîne.

Eger bo derman an lênerîna tibbî we mesrefek tunebe, biçe hingaveke din.




**10. Wêneyên hemî mesrefên din**

Di vê hingavê de, hûn wêneyên hemî mesrefên din ên ku we bo wan muracaeta dravan kiriye, dişînin. Bo nimûne, ew mesref dişê mesrefa temînatê, elektrîkê, înternetê yan mesrefa xanî be.

Bo her mesrefê wêneyek bişîne.




**11. Kontrol bikin ku her tişt rast e**

Di rûpela paşîn de hûn ê kurteya hemî wêneyên ku we bar kirine bibînin. Heger hûn dihizirin ku her tişt ya durust e, hingê bikirtînin BankID'yê û îmze bikin.




**12. Tesdîqkirin**

Dema ku wêneyên bo kontrola nimûneyî hatin barkirin, hûn ê tesdîqek bistînin.




**13. Hat şandin**

Gava hûn malika tesdîqê qepat dikin, hûn ê bihên rûpela ''Mîna Sidor'' (Dozên Min) û li wir hûn dişên bibînin ku statû 'hatiye şandin' nîşan dide. Nuha mesûla te ya Sosyalê belgeyên we yên bo kontrolkirina nimûneyî wergirtiye û dişê muracaeta we binirxîne.